

Insyatîfa Navnetewî ya li dijî şerê li Sûriyeye

Belê ji bo demokrasîyê, Na ji bo mudaxeleyek eskerî!

Em, kesên li jêr imza kirine û xwe mîna beşek ji civaka sivîl ya navnetewî dibînin, bi baldarî li rewşa gelê Sûriyeye dinêrin, ku her roj xwîn dirêje û mirovên bê guneh dimrin.

Bi armanca rawestandina şerê li Sûriyeye em destekê didin vê insyatîfê. Li gorî şandeya ku hevalên me şandibûn Beyrût û Şamê di Eylûna 2012 an de, em bangê li civaka navnetewî dikin ku bi lezgînî mudaxeleyê rewşa Sûriyeye bike bi kesayet û faktorên bingehîn yê li vî welatê hevdîtinan bike, da rê li ber vî şerê çekdarî bête girtin û aşîtiya navxuyî û her weha aşîtiya cîhanî nekeve metrisyê de. Her weha Sûriyeye jî mîna dewletek serbixwe bimîne.

Em li vir bi dengê bilind dibêjin, eger rewş weha berdewam bike, dibe ku şerê niha berfirehtir bibe û dewrî şerekî mezhebî bibe ku dikare li tevahiya heremê belav bibe. Em dixwazin serhildana gelê Sûriyeye mîna destpêkê aşîtiyane bimîne û tenê ji bo azadî û demokrasîyê be.

Em bawer dikin ku dê tu alî di vî şerê niha de diqewime bi ser nekeve. Ev şer dê dirêj bajo. Jixwe gelê Sûriyeye û netewa ereb jî dê nema karibe mîna berê li himberî destdirêjiya hêzên Rojava û Israil despotên li heremê têbikoşe.

Li gorî nerîna me, divê diyalog bête kirin da ku avek li vî agirî bibe û şerekî mezhebî rû nede û defeta mudaxeleya hêzên heremî pêk neyê.

Di vî derbarî de, em li gorî van xalan tevdigerin:

- 1- Em bi temamî destekê didin diyalog û danûstendinê û doza rawestandina pevçûnan dikin. Divê aramî bête garantîkirin û eskerkirina civakê bisekine. Divê bi kezgînî alîkariya mirovayetî ji bo gelê Sûriyeye here û mafê welatiyan yê hîlbijartinê bête garantîkirin.
- 2- Her cûreyê mudaxeleyek eskerî divê bête redkirin. Divê çareserî li esasê berjewendiya gelê Sûriyeye be û ji iradeya wî ya azad derkeve.
- 3- Rêza li mafê çarnûsê divê heman rêza li demokrasî û mafên civakî yê piraniyê be. Divê tu hêz neyê bidûrxistin û hemû di prosesek siyasî de cihê xwe bigrin. Divê lihevkarîna navxuyî bibe bingeha demokrasîyê û

hilbijartinên rasteqînane ku desthilatdariyek demî û dûre dayimî derbixin holê.

4- Divê hizra toleransê di nava civakê de bête belavkirin li ser esasê wekhevî û mafê welatîyê.

Li ser vê bingehê em li vir destekê didin şandeya ku dê di destpêka 2013 an de biçê Sûriyeye bi hêviya ku ev Insyatîf xwestekên gelê Sûriyeye yê azadî û aramiyê bi cih bîne.